

Banga navneteweyî ji bo piştgiriye û têkoşîna li dijî bacên Encûmena Kontrola Darayî li Puerto Ricoyê.

Ez bangî raya giştî ya navneteweyî û diasporaya Puerto Ricoyî dikim ta ku piştgiriya rewşa niha li welatê me bikin. Careke din bi bîr tînim ku Puerto Rico ji sala 1898an de mêtîngeha Dewletên Yekbûyî ye. Ji roja dagirkirinê û heta îro, Dewletên Yekbûyî û rêbazên mêtîngehî, çend qanûnên aborî û polîtîk ên kontrolê ferz kirine (Qanûna Forakerê 1900; Qanûna Jonesê 1917, Mordaza 1947, qanûna 600î ya 1953an, qanûna 7ê ya 2009ê), ku rastiya civakî, aborî û polîtîk a kevintirîn mêtîngehên Amerikayê ji hev xistiye. Wî xwe avêtiye qeyraneke bêçare ya aborî li gel niyeta wî ku talana çavkaniyên me berdewam bike û di heman demê de, mercên jiyana xelkê me yê wek xizmetên tenduristî, perwerdehî bi lez xerabtir bibin ku pê re xwarinên pêwîst bo mirovî gelekî buha dibin, kar kêr dibe û rêjeya tawanan bilind dibe. Koçberî ewqasî zêde bûye ku mirov nikare xeyal bike li gel ku welatê me hîn jî sûdeke mezin dide bo tu karê xwe yan jî betlane dewam bike. Niha, Puerto Rico bi deynên 73,000 milyarî bûye Yûnanistana Karayîbê ku pere di bêrikê de nemane û ev rewş jî paytextê darayî ya Wall Street kêfxweş dike. Encûmeta Kontrola Darayî, ji bo welatî birîndar bikin, 5278 proje belav kirine ta ku fêdê li qerkeran(sîqalk) bikin. Bi ferzkirina heman şewaza pêngavên dewleta nerm, a emperyalîzma berdewambar, yê bîn hatine bichkirin:

Encûmena Kontrola Darayî (JCF) di 12 xalan de:

1. 7 endamên ku JCF pêk tînin dê tenê û rasterast ji aliyê Hikûmeta Federal bîn bijartin. Pêdiviya yek endamî tenê bi îqametê yan karî li Puerto Ricoyê heye. Ew ê ne hêza Birêveberê Puerto Ricoyê ne jî ya qanûnsazên herêmî dê di Encûmena Darayî de tine û dê nikaribin biryaran control bikin.
2. JCF dê bi kêmasî 4 salan berdewam bike. Ji xwe hejmara herî zêde ya salan nehatiye diyarkirin.
3. Encûmena Kontrola Darayî dê çavdêriya tevahiya budçeyê û qanûnên welatî bikin.
4. Çi çaxa bixwaze dikare qanûnên pejirandî bikişîne.
5. Dikare tiştên bi qîmet(xişir, milk, avahî, korporasyona giştî û hwd) bifiroşe.
6. Dê biryarê bide bê kîjan qanûn dikare bi pîvanên bandora darayî bê testkirin û kîjan nayê testkirin, herwiha tehde dê li jiyana tenduristî û çavkaniyên surîştî û civakî yê xelkê bê kirin.
7. Ew ê hêza te hebe k utu meydanan bisekinînin û hejmara karmendan kêr bikî yan wan derxîni.
8. JCS, kar û xebatên zêde ji bo qezenckirina pereyan dê red bike.
9. Ew ê bikare mercên îstismara aborî li ser gelheya temenê wê 20-25 salî, li gorî muçeyaya minîmûm bi qasî \$ 4.25an diyar bike.
10. Ew ê mafê grev û meşan rake.
11. Muçeyên teşwîqê dê ne tê de be. Ew ê wekhevîyê di fonên xizmetên tenduristiyê û fonên din ên federal ne tê de bin. Xwediyên muçeyan jî ne parastî ne.
12. Ew ê tenê berjewndiyên qerkeran(sîqalk) biparêzin.

Em bangî diasporaya Puerto Ricayî li her çar aliyên cîhanê, li tevgerên civakî û rêxistinên polîtîk ên navneteweyî dikin ku piştgiriye bidin û xwe li dijî Encûmeya Kontrola Darayî birêxin. Çawa? Têkeve <https://juntecontralajunta.wordpress.com> û nûjen bike. Agahî û amûrên heycanê bi dest

xînin. Dêrdora xwe û komeleya xwe û agahiyan bigihînin wan û bultenên me belav bikin û li dijî Encûmena Kontrola Darayî derkevin. Ka em bi hev re berxwedanekê ava bikin!

Na ji Encûmena Kontrola Darayî re!

Na ji mêtîngehkariyê re!

Na ji emperyalîzimê re!

Têkilî:

Junte contra la Junta (Puerto Rico)

<https://juntecontralajunta.wordpress.com>

lageteantesqueladeuda@gmail.com

<https://www.facebook.com/juntecontralajunta/>

Comité Boricua en la Diaspora – ComBo- (New York, USA)

facebook.com/comiteboricua

comiteboricua@gmail.com

decolonizepr@gmail.com (Chicago, USA)